

Hêla pir cihê
şanaziyê, bo Hizba
Demokrat çiyê?

»»» R:9



Xwendingeha
Gelawêj

»»» R:2



*Bideştveanîna mafên netewî yê gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

*Duhestînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (380) 20-08-2020 Buha (1000) Tûmen*

75 sal xebat û
berxwedana pîroz

»»» R:6



PDK Îranê,
Rêkxistina Siyaset
Û Exlaq

»»» R:11



Ji Komara Kurdistanê ve heta Rasana nû ya Rojhilatê Kurdistanê, 75 sal xebata berdewam bo demokrasî û rizgariya netewî



Sergotar

Xwendingeha Gelawêj



N: Kerîm Perwîzî

Jiyana siyasî û kultûrî ya civatgehekê, bi hebûna pêvajoyê û vehûnandina hizra yekgirtî ve ber bi serkevtinê diçe û di hegera lawaziya wiha meş û vehûnandinekê de, jiyana siyasî ya civatgehê heta jiyana civakî û kultûrî jî ber bi alozî, û di hin rewşên taybetî de jî ber bi hiloşîn û ji hev perçekirineke yekcarî ve diçe.

Ev hizra bingehîn û rîşedar ku tev civatgehê bi hev ve girê dide, û vehûnîna cîhanbînî û jiyannasiya wê pêktîne, dibe zemîneyek ku tak xwe têde peyda dikin, û jiyana îroyî û armancên wan yên paşerojê pênase dike.

Her wekî xwendingeha Konfosiyo li Çînê û mekteba Firankfort li Alman û xwendingeha Lînkoln li Amerîka, cureke cîhanbînî û jiyana civakî û kultûrî heta siyaseta civatgeha wan, bi awayekî darêtiye, ku piştî derbasbûna dem û hatina nivşên wan jî, jiyana di meşa giştî de li ser heman hêla mûzîkî ya wê xwendingehê tê lêdanê.

Di Kurdiştanê de, xwendingehê hatîye avakirin ku bi derbasbûna demê, berfireh û berfirehtir bûye, û girîngî daye aliyên mirovî û Kurdiştanî, û niha ku 75 sal bi ser avabûna wê xwendingehê re derbas dibe, waneyên xwendingehê di kolan û şeqaman de û di nav deşt û çiyayan de deng vedidin û çiya û bajar jî bi vî dengî hevdu himbêz dikin. Xwendingeha Gelawêjê çendîn waneyên sereke û

rîşedar hene, ku bi derbasbûna demê, nek jar û lawaz nebûne, û ji rê derneketine, belkî sal bi sal nifş li pey nifş geştir û ronahîtir bûne.

Yek ji girîngtirîn waneyên Gelawêjê peyvên pir bi nîrxên Qazî û Qasimlo û Şerefkendî ne ku wekî tavgehekê di nav hundirê civadgehê de dirije, pêdagirî li ser girîngî û nîrxdan bi kirameta mirov bûye, û xema yekem û dawiya wê xwendingehê ji nîgeraniya binpêkirina kirameta mirov ve deşt pê kiriye û di pêxema paraştina wê kirameta mirovî de cangorîtî kiriye.

Waneya duyem jî, pêşxistina berjwendiyên komê li çav berjwendiyên tak, û rîşedarbûna berjwendiyên netewe li hember berjwendiyên girûpî bûye, û cangorî li pêxema paraştina nasname û serweriya netewe de mezintirîn waneyên wê xwendingehê bûne ku rêberên şehîd yên wê û hezaran endam û alîgir û kadr û pêşmergekên wê di pêxema wê de dîlana azadiyê kirine.



Wek çawa di serdemekê de li Yûnanê li ser xwendingeha wê ya binavûdeng nivîsîbûn ku her kes "Hendese" nizane, nabe bê jorê, bi xatircemî ve silogana sereke ya ser deriyê xwendingeha Gelawêjê jî eve ye:

Di pêxema paraştina kirameta mirovî û bideştveanîna serweriya neteweyî de werine jorê. Pîroz be yad û bîra avakirina wê xwendingehê, û xwendevanên wê bi milyonan bin.

Peyama pêrozbahîya Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta 75emîn salvegera avakirina PDKÎ

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê “Mîstefa Hicrî” bi hilkefta 25ê Gelawêjê, 75emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

Xelkê têkoşer û azadîxwaz ên Kurdistanê

Kadir, pêşmerge û alîgirên PDKÎ

Wek agehdar in

Berpirsariya takên hişyar yên civatgeha Rojhilatê û hizirkirin ji bê mafî û reşkirina nasnameya netewa Kurd û xebat bo bideştveanîna mafê serwerî, xala bingehîn ya damezrandina Partiya Demokrat e.

Ev tevgera fikrî li ser bine-maya teşkilatîyên Komeleya Jêkaf geşe dike û ji Partiya Demokrat ve diguhere bi qewareyeke teşkilatî û siyasî bi bername. Serdemanekê ku bîr û hizra çep ya Markîstî bal bi ser jîngeha sîyasî ya Rojhilata Navîn û di vê navberê de li ser Kurdistanê de jî kêşa bû û hizra netewexwazî wekî bîreke paşketî dihate mêzekerin, û bi pîlana împiryalîzm bo parvekirina hêza kedkarên cihanê dihate hesibandin, Partiya Demokrat ji vê aliyê berpirsariya xwe ve, li ser bideştveanîna mafê netewî û rizgarî li jêrdeştî û xebat bo mafê netewî rijdtir bû. Pêka wê peyama dîrokî jî bû ku di yekemîn derfet de di encama guherîna hev kêşeyên siyasî li şerê duyemîn yê Cîhanî di aştê deverê de hate gorê, û bi serokatiya Pêşewayê nemir, Komara Kurdistanê wekî “binyada neteweyî” damezrand.

Herçiqas temenê Komara Kurdistanê pêka qiyasa hejmar û roj û meh kêmanî, lê mîrat û dîroka xwe sparte paşerojê û bû bi rêbaz; Bi awayekê ku nifşên piştî wê, xwe bi hev welatîyên wê Komarê dizanin û li beşên din

yên Kurdistanê jî nîşaneyê samaneke netewî pêve ye. Bi wî awayî, bingehêke wiha qahîm bû heşt û hizra Rojhilat ku piştî herifîna Komarê û jidarvekirina Pêşewa û birêveberên wê yên din, bo vejîn û bingehdanîna wê, bûye hêleke netewî li stratîjî û bernameya siyasî ya hizba avaker ya wê; Hizbek ku bi dirêjahîya dîroka 75 saliya xwe, li hember du dîktatorên Paşayeti û Îslamî, li ser heman hêlê berdewam bûye. Niha ku netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, roja jidayîkbûna Partiya Demokrat bilind radigre, zêdetir ji berê bo gihîştin bi daxwazên xwe yên kevna hêvêdartin e. hişyartir li hemû demê xebatê bo dike, û herwisa Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê jî pêşeng û rêxerê wê xebatê ye. Herçiqas di heyama wan 75 salan de, bilî vê ku piştî û paş damezrandina Komara Kurdistanê û heyameke kîm piştî herifîna rejîma Paşayeti û bi deştîlata gihîştina Komara Îslamî, ku ser hev hemû ji çend salan derbas nabe, Partiya Demokrat bi azadî di Kurdistanê de çalakî tînebûye, lê di wê heyama kurt de di deverên li jêr deştîlata xwe de bi kiryar û bi awayekî damezrawî, li pêxema behayên azadî, demokrasi û serweriya nîştîmanî û azadiya bîrûbawera siyasî û olên cuda, berçavgirtina mafên kêminyan, girîngîdan bi ziman, xwendin û perwerde, beşek ji wan pîrsan in ku bi bername û bi kiryar hewil bo daye.

Xebat bo rizgarî li jêrdeştî û ew armancên bilind û pir nîrxên ku Partiya Demokrat hewil bo daye, digel binemaya hizrî û siyasî ya navendê li serdemê herdu rejîmên Paşayeti û Îslamî de neteba û li dijî wan bûye. Lewma wan, Partiya Demokrat li dijî deştîlata serero û paremayî yên xwe dizanin û bi her awayekî ku di şiyana wan de ba, hewla perawêzxiştin û jinavbiran wê didan. Jinavbirina rêberên wê hizbê, armanca serke ya wan bûye,

her di vê derheqê de, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr Qasimlo û Dr. Şerefkendî, bi pîlana wan rejîman têne şehîdkirin.

Lê ezmûna 75 salên derbasbûyî nîşan daye ku şehîdkirina wan rêberan û hezaran ji têkoşerên din yên Partiya Demokrat, guriya agirê vê xebatê gerimtir û geştir kiriye. Berevajî ji bîra teng ya dujminan, Partiya Demokrat ev Partiyê nîne ku bikarin bi xedir û xiyanet û pîlanan ji nav bibin. Partiya

bi heman awayî li kêmkurî û veqetandinan jî encama heman rewşan in, di Partiya Demokrat de her bi wî awayî ye.

Di vê dîroka 75 sale de, nebûna derfeta çalakiyên Hizbê bi awayekî azad di Rojhilatê Kurdistanê de, dîr ji welat û veqetandin ji xelkê, wekî çavkaniyeke mirovî û rêkxistinî ya wê, heta astekê valahî û boşayî û veqetîna din jî derheq hizb û Rojhilat bicih hêlaye. Eva jî bixwe



Demokrat, nasnameya netewî heye û pareke neveqetîya ji dîroka Kurd e. Bi dirêjahîya qonaxên xebatê, hewil bo dabînkirina serweriya netewa xwe bi ser axa xwe de daye, û dehan sal e ku rêxer û pêşengê tevgera netewî-demokratîk a Rojhilatê Kurdistanê ye. Nabe ku behsa dîroka hevçerx ya tevgera rizgarîxwazî ya Kurd bê kirin, lê rola dîrokî ya vê hizbê nedîtî bê girtin.

Dîroka 75 sale, tenê dîrokeke pêkhatî ya siyasî û teşkilatî nîne, belkî dîrok û vebîranîna dehan sal xebat û qurbanîdan e ku bi hezaran têkoşer û şoreşvan li çendîn nîfş û tevatat û tex û deverên Rojhilatê Kurdistanê têde beşdar bûne.

Gerçi Partiya Demokrat di nav wê dîrokê de xwediyê serwerî û deştîkt û serketin bûye, digel vê yekê jî bêguman li kêmkurî û şaşîyan de bidûr nebûye. Hekî gelek caran deştîkt û serkevtin encama rewşa dem û cih be,

sedema komek ji kêmkurî, neşîyanî yan kêmkurîya wê bûye. Ew veqetandine jî gelek caran dibe sedema siyasî û bernameyeke şaşî ya wisa ku dikare xisarbar be.

Bi balkişandin bi wan raştîyan, Partiya Demokrat hilgîrê hinek kêmkurîyan bûye ku dibe karê zêdetir li ser bê kirin bo vê ku kêmkurî kêmtir bin. Yek ji girîngtirîn kêmkurîyên wê, aliyê “perwerdeya” kadir, pêşmerge û endamên wê ye. Bi watayeke din nebûna îmkanat û derfeta pêwendiyên zîndî û biroj digel jîngeha Rojhilatê û herwisa rewşa serkut û rewşa sext û dijwara xebatê, bûne sedem da ku di çend qonaxekê de guherînkariyên civatgehê kêmtir û direngtir di bername û pêkhatîya siyasî û rêkxistinîya Hizbê de reng bide, û hizb pêka hewcehiyan

»»»» Doma R:3

nekarî bi wan guherînkariyan aşina bibe û xwe digel wan biguncîne, nekarî perwerdehiya xwe di astê wan guherînkariyan de bibe serê û pêkhate û bernama xwe digel zemîneya guherînkariyan hevaheng bike, lewma gelek caran raştî arîşe û pirsgirêkên mezin û piçûk hatiye.

Xaleke din ku girîngiyeke taybet bixwe ve heye û dibe em tiliya xwe danêne ser wê, pêgeha cografîyayî û rola stratîjîkî ya Başûrê Zagrosê li rêkxistina tevgera netewî ya Rojhilatê de ye. Pêwera serkevtina dawî bo tevgera Kurd li Rojhilatê wekî “binyad” a netewî û cografîyayî, pirkirina wê valahiyê ye, û veguhaştina rehendên xebatê ye bo wê beşa nîştimanê. Tevî siya-

seta kevnar a dagîrker bo asmîlekirin û veqetandin û helandina nasnameya Kurdî ya wê deverê ye, hizra netewî û Kurdayetî di wê deverê de heta tê geşe dike, lê me wekî Partiya Demokrat û serbarê hemû bernama û hewlan, nekariye wê valahiyê bi tewawî pir bikin.

Dîdgehên vekirî û hizra rexnegerane bo dîroka 75 saliya Partiya Demokrat, fezliyeteke fikrî û pêdiviyeke perwerdeyî ye bo bi xwe ve çûn û bi rojkirina siyasî û bernamê me. Ew dîdgahe wisa dike ku bi hurdfî em bal bikişînine ser arîşe û kêşeyên heqîqî di çarçoveya wê de.

Di dawiyê de ez dixwazim îşareyê bi wê raştîyê bikim ku bi hemû kêmkuriyên wê ve jî, Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, niha jî cihê hêviya piraniya netewa Kurd li Rojhilatê ye. Civatgeha

Rojhilatê bi diruştî wê Hizbê bi ya xwe dizanin, lewma bi serkevtinê wê kêfxweş in, bi paşekêşe û lawaziyên wê heştyar in, hêz û moralê pê dibexşe û di tengahiyan de piştevanîyê jê dikan. Di hemû beşên Kurdiştanê de jî, bi çavekî rêz û hurmet mêze dikan. Ev rêz û pêgehe jî bigiştî berhema xwîna şehîdan e, ji rêberên wê ve bigre heta digihîje hezaran kadir û pêşmerge, endam û alîgir, kêmendamiyên hepsiyên siyasî; Berhem û têkoşan û xebata çendîn nîş e ku bi sedan hezar kes pêka şiyar û rewşê piştevan û alîkarê wê bûne û xwedî lê derketine, lewma di raştî de hemû şanazyên wê jî bo tev qat û texên Kurdiştanê dizavire.

Bo me pêşmerge Partiya Demokrat jî, cihê şanazyêke mezin e ku li refên Hizbeke netewî ya wiha mezin de

xebatê dikan.

Di 75emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat de, ez serê xwe li hember canê paqij ê şehîdên rêya xebat û têkoşana 75 saliya Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, û hemû ew şehîdên ku ji rêya azadiya Kurdiştanê ve canê xwe yê paqij gorî kirine ditewînim, û em emegnasî û pîrozbahîya xwe bo malbatên serbilind yên şehîdan, bo hemû kadir, pêşmerge, endam û alîgirên wê Hizbê nîşan didin û soz didin domkerê rêya wan a tijî ji serwerî bin.

Di wê bîr û yada mezin de, peyama yekrêzî û hevxebatî bo hemû aliyên siyasî yên Rojhilatê, civatgeha xweragir a medenî û tev qat û texên Kurdiştanê ducare dikan.

Bijî PDKÎ

Serkeştin bo Kurdiştan

Daxuyaniya Navenda Siyasî bi hilkefta 75emîn salvegera avabûna PDKÎ

Navenda Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi hilkefta 25'ê Gelawêjê, 75'emîn salvegera avabûna PDKÎ daxuyaniyek belav kir.

Daxuyanî wiha ye:

Hevnîştimaniyem rêzdar

Hemû xelkê xebatgêr û xweragir ên Kurdiştanê

Hogirên demokrasî û mafê neteweyetî

Malbatên serbilind ên şehîdan

Hepsiyên xweragir ên siyasî Kadir û pêşmerge cangorî, endam û alîgirên dilsoj ên PDKÎ

Hizba têkoşer û hezkirî ya hemû xelkê Kurdiştanê, Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê 25ê Gelawêja îsal a 1399 a Rojî (2020 a Zayînî) 75 saliya tijî ji serweriya xwe derbas dike û “Yubîla El-masî” li singê xwe dide. Bi vê hilkeftê em pîrozbahîyê li hemû azadîxwazan bigiştî

û hemû xelkê Kurdiştan, malbatên şehîdan, hepsiyên xweragir ên siyasî, kadir û pêşmerge û endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi taybetî dikan, û em serê xwe li hember canê paqij ên şehîdan ditewînin ku di heyama wan 75 salan de û li meşa berevanî li maf û azadiyên Kurd û Rojhilatê Kurdiştanê de cenê xwe goriyê netewa xwe kirine, herwisa em spas û pêzanîne arasteyê hemû ew kes û kesane dikan ku di her beşeke wê xebata 75 sale de îcar bo her demek jî bûbe dikan.

Mêzekirin li derbasbûya hizbê û balkişandinek li dîroka xebat û xweragiriya PDKÎ di wan 75 salan de derdixe ku di wê heyamê de çî rêyeke dijwar û pir hevraz û nişiv biriye, çî serweriyek tomar kiriye, çî serkevtin û deştetek bi deşt ve aniye, çî helwetên netirsane û diruşt û heqîqetbînî bûye, çendîn birînên bi êş hilgirtiye û bi çok de nehatiye, hemû evane îro piştî 75 sal nîşandana bejn û balê Partiya Demokrat û Demokratane.

Partiya Demokrat wek hewceyîyeke dîrokî û di heman demê de minasib û digel serdem, li 25ê Gelawêja sala 1324 a Rojî û li ser bingeha Rêkxistina Komeleya “Jêkaf”, wek rêkxistîneke berfirehkerî a bîr û heştî neteweyetî û bi deştê “Qazî

nîşanderê hewceyîya yekgirtî û hevxebatî digel part û aliyên siyasî yên Îran û netewên Îranê bûn.

Partiya Demokrat a Kurdiştanê 160 roj piştî avabûnê bi lêkdaneweyêke diruşt û bi helsegandina keş û hewayê



Mihemed” hate avakirin. Avabûna Partiya Demokrat tenê jîdayîkbûna asayî nebû, belkî deştêpêka hatina gorê ya Partiyêke moderin, bawermend bi demokrasî bi bernamêyeke rohn a siyasî bû ku di 8 bendan de hatibû formolekirin û naveroka demokrasîkiya hizbê nîşan dida û çend esil li “ûlewiyeta” têkoşîna xwe de danîbû ku

siyasî li Îran û Kurdiştanê piştî şerê duyemîn yê cîhanê karî deştêhelateke siyasî û kiyaneke modern a Kurdî li şeweya Komarî li 2ê Rêben-dana sala 1324an a Rojî de bi serokayetiya Pêşwayê nemir Qazî Mihemed ava bike û di kombûneke berfireh li bjaraê

»»»» Doma R:4

Mihabadê de hem Komar û hem jî bernameya kar û têkoşîna Komara Kurdistanê rabîgihîne. Bi vî awayî Komara Kurdistanê wekî berhema avabûna Partiya Demokrat a Kurdistanê li beşeke Kurdistanê de xwe dirxişt. Avakirina Komara Kurdistanê şanaziyeke dîrokî bû bo Partiya Demokrat a Kurdistanê li beşeke berçav ji maf û azadiyan û mafê netewayetî ya Kurdî ji zorbarî ve bi dest ve anî. Heta Kurdan ji beşên din jî wekî destketeke cihê hêviyê mêze dikirin û hejmarek ji wan ji birêvebirina kar û erkên wê de beşdar bûn.

Ji taybetmendiyên ber çav ên Partiya Demokrat berde-wamî û domkirina xebatê di her rewşekî de ye, em dibînin ku piştî herifîna Komarê jîdarvekirina Pêşewa û hejmarek ji berpirsên bilind ên hizbê û Komarê û hepskirina hin rêberên hizbê û karbideştên Komarê û avarebûna komek ji têkoşerên wê, hizb ji têkoşan û çalakî razandin nesekînan. Hebûna sedan têkoşerên wê hizbê di girtîgehên rejîma Şah de û bêserûberkirina wê bi qewlê rejîma Paşayetî dîrgeha aram a Îranê, bi sedema rêkxistina bereyên çekdarî ji aliyê hizbê ve li salên 46 – 47an de belgên îsbatkirî yên wê raştiyê ye.

Hûr û heqîqetbînîna siyasî û lêkdaneke diruşt û neçûne jêr fişara keş û hewayaya zal lê nerast bi ser jîngeha siyasî ya Îranê de, taybetmendiyek din a Partiya Demokrat bû. Dema ku şoreşa gelên Îranê dest pê kir û Partiya Demokrat bi teybetî di Kurdistanê de dewreke bandordarî tede hebû piştî serketina wê şoreşê, Xomêynî xweşt ku di refrandomekê de nîzama paşeroja Îranê diyarî bike, ragihand ku hewceye xelk di navbera rejîma Paşayetî û Komara Îslamî “ne yek peyv zêde û ne yek peyv kê” de yekek ji wan bipejirîne. Wê demê mixabin piraniya xelk û hêzên Îranî bi awayek berçav ji çep û Îslamiyan û heta kesayetiyan Sêkolari, bê vê

ku beravirdekê li ser wan bikin an jî naveroka Komara Îslamî ya Xomêynî agehdar bin di heman demê de rejîma Paşayetî hatibû retkirin û deng bi sîstema cihê pesenda Xomêynî dan, Lê Partiya Demokrat û xelkê Kurdistanê bi du sedeman di refrandomê de amade nebûn.

Yekem: Eva ku refrandoma wan bi şeweyeke demokratîkî nedizanîn, çimkî bi mifawergirtineke xirab ji nerizayetiya xelkê li hember rejîma Paşayetî û nezivirîn bo wê sîstemê ji rûyê neçarî ve deng dan bi Komara Îslamî.

Duyem: Partiya Demokrat û xelkê Kurdistanê bi dîr ji keş û hewayaya zal û nerast, tenê bi danîna berhev ya xwe alxahînbûn ku li rejîmeke îdolojiyeke olî û mezhebî de ne demokrasî cihê wî dibe ne mefê netewayetî ya gelên Îranê bi dest ve tê, belkî îflaskirin û cudahîdan û dîrxistin dibe siyaseta û kiriyara wê rejîmê, ew helweteyaya wê demê ya Partiya Demokrat ji aliyê hin aliyên Îranî ve raştî rexna hat û tohmet lê kirin. Lê niha her ew hêz û aliyane û heta piraniya xelkê Îranê îtraf bi nerîna diruşt û helwesta heqîqî bînin ya wê demê ya Partiya Demokrat dikin û ew şanaziye bo Partiya Demokrat û netewa Kurd maye ku ji destpêkê ve deng bi hatina ser kar a rejîma Komara Îslamî ya Îranê neda.

Rêçkeşikeştineke din a Partiya Demokrat berevajî keş û hewayaya zal bi ser hizb û aliyên çep li pêwendî digel sosyalîzm û dîktatoriya polorîtariya de eve bû ku Dr. Qasimlo armanca paşeroja hizbê ji sosyalîzm ve diguhere bi sosyalîzma demokratîk ku hem cudahiya nerînen hizbê li vê derheq digel hêzên çep derxe, ku hem jî ji vê çavkanî girtibe ku nabe hizbek bo demokrasî xebatê bike lê armanca paşeroja wê curek ji dîktatoriya be, ew biryara hizbê û ev nerîna Dr. Qasimlo ku xirabtirîn demokrasî ji baştirîn dîktatoriye pê baştir bû, bi tundî raştî gefên parek ji çepan hat, lê niha pareke berçav her ji wan hêzan ew rêye

girtine ber xwe.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û Komara Îslamî ya Îranê

Rejîma dîktatorî û xwediyê îdolojiyeke paşketî û dijî mirovan ya Komara Îslamî ya Îranê gelek zû li hember helwestên heqîqetbînî yên Partiya Demokrat dijekiryan nîşan da û rejîm digel vê ku dîzanî Partiya Demokrat xwediyê çî pêkeheke bihêze, û berbijêrên wê ku tenê ji hilbijartina azad ya destpêka serketina şoreşê de di piraniya bajarên Kurdistanê piraniya dengên wan bo meclîsa şwreya Îslamî misoger kiriyê, û Dr. Qasimlo li parêzgeha Urmiyê wek nûner bo Meclîsa Xubregan hatiye hilbijartin, bi vê halê jî Partiya Demokrat bi Hizbeke hilûşiyayî ragihand û pêşî ji nûnerên hatinî hilbijartin ên netewa Kurd bo meclîsa şwreya Îslamî û Xubregan girt.

Bi vê jî ranewesta û li 28ê Gelawêja sala 1358an a Rojî de fitwaya cîhadî li dijî xelkê Kurdistanê derkir û ji vir ve şereke naberanberî û zalîmanê û bê rehmanê bi ser hizbê û xelkê Kurdistanê de sepand û ji hemû aliyekê ve û bi hemû hêz û îmkanatên şer ve êrîş kire ser Kurd û Kurdistanê.

Helwesta Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê li hember wê biryara dujminkarane ya rejîmê çî bû?

Partiya Demokrat û hêzên siyasî yên Kurd û xelkê Kurdistanê tenê du rê pêşiya wan bûn, yan li hember zordarî û mafên bînpêkirî ya rejîmê serê xwe bitewînin ku ew yeke digel taybetmendiyên hizbê û netewa Kurd yek nedigirt, yan jî hewce bû li hember her êrîş û gefek û pîlanekê de xweragir bin, û xebatê bi hemû awayekî bidomînin ku eve hilbijarteya hêjayiya Kurd û Demokrat bû. Ee siyaseta rejîmê ya şerê binavûdeng a Sine, Pawe û Neqede, kavilkariya dehan gund û komkujiya xelkê bêberevan li pey xwe ve anî, lê

bi sedema xweragiriya Hêza Pêşmerge û xelkê Kurdistanê, piştî 3 mehan, Xomêynî neçar ma bû ku şer bisekinîne û biryara civînê bide ku ev jî bo xwe amadekirin û rêkxistina hêzên xwe bû.

Meşa xebat û têkoşana 75 saleya hizbê û xortên netewa Kurd bê rûndik û xwîn û bê xerc derbas nebûye, hezaran têkoşerên Demokrat canê xwe goriyê domkirina xebatê û gihîştin bi armancên Kurd kiriyê ku di nav wan de rêberên me Pêşewayê nemir Qazî mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî û dehan endmên rêberayeti û fermande û hezaran kadir û pêşmerge û endamên kêrhatî yên hizbê tene dîtin, herwisa hezaran xelkê bêberevanî yên Kurdistanê bi destê hêzên serkutkar yên rejîmê şehîd an jî kêmendî bûne, yan di girtîgehê de raştî azar û îşkence hatine, bi dehan car binke û bargehên hizbê topbaran, xomparebaran û mûşekbaran kirine, lê cihê şanaziyeke ye ku hemû ev birînen êşdar ne ku serê xwe netewandine, belkî ji rêya xebat heta gihîştin bi maf û azadiyên xwe sortir û pêdagirtir bûne. Xuya ye bergiriya qehrimanane ya pêşmerge û xelkê Kurdistanê tenê ji bergiriya çekdarî de berteng nebûye, xebata bajar û hereket û xwenîşandanên xelkê di wan heyaman de bi taybetî rabûna bajarên wê li salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û komek boneyên dinê de, aliyeke girîng a din ya wê xebatê bû.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi wan hemû taybetmendiyên ku bi kurtî îşare pê hate kirin ti dem îdia nekiriye ku bê şaşî bûye, lê girîng eve ye ku ti şaşiyê wisa nekiriye ku xwe nekaribe qerebû bike.

Niha piştî 75 sal xebat û têkoşan, eva ku PDKÎ pê nas dike, siyaseta diruşt û heqîqetbîn, cangoriya têkoşerên Demokrat li bilindtirîn asta xwe de û piştevaniya hertimî ya xelkê

»»»» Doma R:5

Kurdiştanê li hizba hezkirî ya xwe Hizba Demokrat e.

Hemû xelkê xweragir ên Kurdiştanê, têkoşerên cangorî ên Demokrat;

Piştî 75 sal temenê hizba me, xebata me ya niha dijî dîktatoriya rejîma Komara Îslamî ya Îranê her berdewam e, rejîmek ku bi îdolojiya paremayî û kevneperestane ve dijî hemû daxwazên demokratî û netewayetiya me disekîne, ne bawerî bi demokrasî heye ne bi mafê neteweyan di Îranê de, ne mafê mirov bi girîng dinase, belkî bi diyardeyeke Rojavayî nas dike, li dijî mafê yeksaniya jin û mêr e, hemû daxwazeke azadîxwazane û mirovî bi serkut bersiv dide.

Lê ew rejîme har û bê hewsare li encama kiryarên xwe yê nedirust û necî û midax-

ilekirin di nav karûbarê welatan de rewşeke dijwar bo xwe pêk aniye, û ji wê aliyê jî xelkê Îranê raştî jiyanek naewleh û derbaskirineke dijwar hatine, di sata cîhanê de ketiye dijayetiya komek welatan ku ti dijayetiyeke digel gelên Îranê nînin, ew rejîme terorîzma xwe wek beşeke cudanekirî ji siyasetên xwe dom dike û wekî maka terorîzmê hatiye naskirin ku biryara dîrokî ya dezgeha qezayî ya welatê Almanê, piştî terora Dr. Şerefkendî û hevalên wî, belgeya berçav ya terorîzm û riswayiya wê rejîmê ye, bo berfirehkirina bawerên wê yê paremayî deşt ji ser çend welatên deverê de girtiye û dahata xelkê Îranê dike xercê deştê û girûpên terorîstan di wan welatane de.

Tev ew rewşaneyên ku rejîm raştî hatiye û tê ketiye, derfeta xebatê li dijî Komara Îslamî ya Îranê berfirehtir dike. Lewma em bi amadeyiyeke zêdetir û qahîmtir xe-

bata xwe ya rewa dom dikin. Rasana Rojhilatê yanî xebata Çiya û Bajar ku dengvedaneke berçav hebûye, wekî biryareke girîng a Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê berfirehtir û bi hev re girêdartin dikin, ev hindeyê ku rejîm dujminan bo xwe di-afiîne, em jî çend beranberê wê bo peydakirin û parastina pêwendî digel dostên xwe têdikoşin. Bi alxahîni ve hevxebatiya me, zamina gihîştin bi armancên me ye, biryara kongereya 16an bo pêngavavêtineke micid ber bi yekgirtin ve û bihêzkirina refên Partiya Demokrat, pêkhatina Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdiştana Îranê û kongereya neteweyên Îrana federal di vê çarçêveyê de em mêze dikin.

Carek din 75 saliya avabûna hizbê li hemû xelkê Kurdiştan û evîndarên Demokrat pîroz be. Silav ji canê paqij ê Pêşewayê nemir Qazî Mihemed avakerê Partiya Demokrat.

Silav ji Partiya Demokrat avakerê Komara Kurdiştanê û domkerê rêbaza rêberan û şehîdan.

Silav ji canê paqij ê tev şehîdên rêya rizgariya Kurdiştanê.

Em emegdariya xwe pêşkêşê malbatên serbilind ên şehîdan dikin.

Rêz û pêzanîna me pêşkêş bi têkoşerên Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, domkerê rêbaza Pêşewayê nemir Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî.

Neman bo Komara Îslamî ya Îranê, serketin bo xebata Hizbê û netewa me Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Navenda Siyasî

Gelawêja 1399 a Rojî

Tebaxa 2020 a Zayînî

75 sal xebat û berxwedana pîroz



N: Dara Natiq

Di 25`ê Gelawêja Îsal de 75 sal bi ser temenê pîr ji deştkevt û serweriya Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê û xebat û tekoşîna pîroz û binirx a wê re derbas dibe û "Yûbîla Elmasî" li sîngê xwe dide. Dameziradina PDKÎ verçerxanek girîng di dîroka siyasî a gelê Kurd û detpêka xebatek modern û rêkxistinî bû di Rojhilatê Kurdiştanê de ku bû bi bîngeh û deştpekek nû a xebata neteweyî bo tewahîya Kurdan.

Ceribîn û ezmûna siyasî û rêkxistinî a Komeleya Jêkafê (K-J) bû alîkar ku hizbek siyasî li ser xîm û bîngeha neteweyî û nîştîmanî ya wê



were damezrandin. Eva bû ku 75 salan berî niha di 25`ê Gelawêja sala 1324`an a Rojî de Partiya Demokrat a Kurdiştanê li ser deştê Pêşewa Qazî Mihemed û li ser xîmê K-J, ji dayîk bibe û çavê xwe bi rûyê dinê vedike û dibe cihê hêvî ya gelê Kurd û bandora xwe li ser doza berheq a Kurd li beşên din yê Kurdiştanê jî çê dike.

Avabûna organîzasyon û rêkxistinê siyasî û serdemiyane bi navê Partiya Demokrat di wê rewşa aloz a siyasî de bi guhartinek

mezin, çarenivîssaz û bibandor li dîroka tevgera rizgarîxwazî ya Kurdan de tê hesabandin û di raştî de nîşana zanabûna rêberên wê partiyê û hişyariya siyasî û netewî a civaka xelkê Rojhilatê kurdiştanê di wê demê de tê hesabandin.

Bizava rizgarîxwaz a Kurd bi avabûna PDKÎ bû xwediyê bername û stratejiyek bibandor û organîzasyonê siyasî û modern. Saziyek ku li pêvajoyê piroseya xebat û tekoşîna siyasî û neteweyî de asta hişyariya siyasî û

mafîxwazî a xelkê Kurdiştanê bibe jor û ji vê riyê ve jî berevaniyê ji daxwaziyên netewî ên berheq kurdan dike û bi misogerkirina wan cehida avakirina kiyan û deştihlatek netewî dide û tekoşîna xwe nevestane heya îro berdewam dike. Avakirina yekem Komara modern û demokratîk a Kurdî bi navê Komara Kurdiştanê jî piştî 6 mehan bi ser temenê Hizba Demokrat de eyankerê vê raştîyê ye. Em dikarin bêjin ku Partiya Demokrat yekem partî bû ku bo cara ewil piştî avabûna xwe di demeke kin de karî hêviya gelê Kurd bi awayekî Komarî di parek ji Kurdiştana Îranê de ava bike û tama azadî û hebûnê di wê para Kurdiştanê de bide gelê xwe û bi vî awayî rûpeleke zêrîn bêxe ser rûpelên dîroka Kurd û serkevtineke mezin bo gelê Kurd misoger bike.

»»»» Dom R:7

»»» Doma R:6

Bi derketin û avabûn Hizba Demokrat, tevgera Kurd reng û rûçikek pêşkevtxwazane bi xwe ve girt. Reng û rûyek ku hilgirê rabûn û Rasana civaka Kurdî bûye. Di vê Rasanê de, gotar, stratejî û taktîkên cuda kar li ser tê kirin û xebata neteweyî derbasî qonaxek nû û bi bandor dibe.

Partiya Demokrat a Kurdistanê jî, ji bo bidestxistina mafên neteweya Kurd ji şewazên cuda û serdemiyane mifah standiye. Lê hin tiştên mayînde li cem wê partiyê hene ku ti caran nayên guhertin û ew jî, maf, nasname, ax, welat, wekhevî û kerameta Kurd û Kurdistanîyan e. “Ji ber vê çendê hem avakar û xebatkarên cangorî yên wê partiyê, dibe riha wan şa be ku partiyeke wisan avakirine û hem jî mîratgir û xebatkarên wê partiyê û civatên xelkê Kurdistanê dibe bi vê çendê serbilind bibin ku xwediyê partiyeke wisan in, ku serbarê derbasbûyiyeke dîr û dirêj û pir serfiraz, dirûşmên wê bi giştî ku derikandina demokrasî û bidestxistina mafên neteweyî û azadiya gelê Kurd li Kurdistanî Îranê ye, ne tenê her kevin nebûn û nemehiyan e, belkî di cîhana îro de pitir ji her demekê rewayî û mirovahî bûna xwe selimandine.

PDKÎ serbilind e bi vê ku her ji rojên destpêka damezrandina xwe ve heya niha, ku 75 sal bi ser temenê wê re derbaz dibin, bo nasnameya neteweyî û demokrasî û azadiyê xebat kiriye, û di vê pêxemê de gelek qurbanî daye, ew armancên ku serdemekê ji aliyê hinek aliyên fikrî ve, weke paşvemayî û hizra tayifegeriyê dihatin dîtin, lê niha gellek ji wan aliyên, bi salan e ku ba dane, û xwe wekî alahilgirê van hizr û buhayan dihesibînin, ku PDKÎ li ser hatiye avakirin, eva jî ew raştiya ye, ku partiya me gellek zêdetir ji wan, ji hewcehiyî û daxwazên xelkê Kurdistanê têgihîştîye, hewcehiyek ku xwe li serveyî xak

û netewe de dibîne, ku hertim armanca dijmin bûye, bona vê ku van bihayên bilind kêmbuha û tine bike, û xaka wê dagîr bike, û bîr û hizra neteweyî di xwe de bihelîne, û ji vê biyavê ve, ji tu cinayet û zulim û zordariyekê destê xwe neparastiye.

Di dema 75 salên derbasbûyî de, PDK Îranê di pêvajoya xebat û berxwedaniya xwe de bi awayekê tevî dujminan ji aliyekê û tevî heval û dilsozên gelê Kurd ji aliyekê din ve liviya ye ku ev partiye ji bilî derbasbûyîn û bizav û tekoşîna xwe, pêşeng û serbilind di nav xelkê mafxwaz

partiyekê ku rêz ji bo nîrx û buhayên mirovî didanê hatiye naskirin û di pêxema xebata bixwîn de mifah ji alavên nejhêhat û sinca neşariştanî nebirî ye û amûrên nepîroz ji bo armancên pîroz destnîşan nekirî ye û dest Ji bo kiryarên dîr ji yasa û rêsayên cîhanî û mirovî nebirine. Xebat û tekoşîna xwe li ser bingehê îroyîn û bi mifahwergirtin ji mêtodên pêşkevî û li ser bingeha zagonên cîhanî û li gor berjewendiyên neteweya Kurd meşadiye û heya vê gavê jî her berdewam e.

Bê guman ev hitbar û nifûz û baweriye ji bo Partiya De-

sereke ya xebat û piştevaniya fermî û herî bihêz û bibandora xwe nezanî ba.

Pêvajoya xebat û tekoşîna PDKÎ di heyamê 75 salên derbasbûyî de, xwediyê gelek qorbanî û cangorîtiyên mezin bûn ji aliyê xurtên azadîxwaz û şoreşvanên neteweya me ve. Bi hizaran xebatkar û welatparêzên Demokrat jiyanê xwe goriyê berdewamiya xebat û gihîştin bi armancên pîroz yên rizgariya gel û nîştiman kirine ku di nava wan de rêberên mezin û karîzmatîk yên neteweya me, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendi



û azadîxwaz yê Kurdistanê û civata azadîxwaz a Îranê û gelê Kurd de, li parên din yên Kurdistanê bûye sedema hezkirina wê. Rola rêberîkirina bizav û tevgera azadîxwaz a gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê bi jêhatî bi cih anî ye û baweriya civatên xelkê Kurdistanê bi awayeke berçav bi dest ve anî ye û di nav kom û civatên navneteweyî û herêmî û Îranî û parçeyên din yên Kurdistanê de xwedîhitbar û bawerpêkirî ye. Bi

mokrat a Kurdistanî Îranê ewqas rihet û misanahî pêk nedihat, hekî ev partiye xwediyê siyaseta û stratejiyê raşt û usûlî û raştbînane nebiha, silogan û diroşmên wê ji hêvî û daxwazên û di nava dilê xelkê Rojhilatê Kurdistanê û gelê Kurd bi giştî ve çavkanî negirtiba, hekî cangorîti û fîdakarî û qarimaniya pêşmerge û endam û alîgirên wê partiyê ev hinde zaf neba û civatên xelkê Kurdistanê bi çavkaniya

tên xuya kirin. Partiya me di vî heyamî de hevrişî gelek qonaxên dijwar û sext yên xebatê bûye û pir bûyerên nexwaş hatine ser rêya wê li ti car ji berdewamiya xebata xwe bo azadiya Kurdistanê nesekiniye û hertim alaya şoreş û azadiyê bilind ragirtiye û berdewam bûye. Piştî derbasbûna 75 salan ji xebatê, PDK Îranê niha jî partiya sereke û xweştevî ya civata xelkê Kurdistanê ye.

Hevpeyvînek li derheq 75emîn salvegera avakirina PDKÎ, digel siyasetmedar û nivîskarê Rojavayê Kurdistanê “Ebdulezîz Qasim”



Ebdulezîz Qasim:
PDKÎ cihekî bilind di nax û wijdana milletê kurd de heye û herdem cihê hêviya vî milletî ye

Hevpeyvîn: Keyhan Mihemedînijad

P: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ber bi 75 saliya avabûna xwe ve diçe, gelo tu wekî kesekî siyasî û revşenbîr xebata wê partiyê çawa dinirxînî?

B: Ez li deştê 75 salroja damezrandina Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê li tevaya gelê kurd û bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê û pêşmerge û malbatên şehîdan û endam û alîgirên wê pîroz dikim û hêvîdarim ku ev helkeft bi xêr û xweş li ser Gelê me vegere, herwiha ji ber nirxa mezin ya rêberê kurd şehîd Pêşwa Qazî û Komara Kurdistan (Mihebad) dikarim bêjim ku pêdivî heye ku yubîla almasî ya PDKÎ wekî helkefteke netewî û dîrokî li tevaya Kurdistanê bihête saxkirin, herwisa ku damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê ji berî 75an wekî yekem partiya siyasî li tevaya Kurdistanê, pêdivî bi gelek nivîs û lêkolîn û babetên dîrokî û siyasî û civakî heye, û peydabûna modêla partiyeke demokrasî wekî PDKÎ li Kurdistanê ji berî 75 sala bi xwe bûyereke siyasî û dîrokî girîng bû ji bo pêşvebirina xebata netewî û bihêzkirina têgeha nasîyonalîzma kurdî nemaze di serdema belavbûna modêla komel û partiyên komînist de.

P: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê pêwendiyêke dostane digel Partiyên Rojavayê Kurdistanê hebû û heye. Gelo pêwendiyên PDKÎ digel partiyên Rojavayê Kurdistanê li çi asteke de bûye û tu çawa dinirxînî?

B: Têkiliyên dostane di navbera PDKÎ û partiyên Rojavayê Kurdistanê de her ji dema Dr. Qasimlo û heta niha hene, lê mixabin ku ew pêwendî ne di asta pêdivî de ne bi tenê dikevin di nava çarçoveya hevdîtinan de, ku pêdivî bi têkiliyên zêdetir heye, her ji ber pîrsa netewî û herwiha jî ji ber têkiliyên di navbera rejîma Sûrî û rejîma Îranê de ji ber wiha pêdivî bû li hember wan têkilî di navbera Rojhilat û Rojava de zêdetir be, dîsa pêdiviya me têkiliyên rewşenbîrî jî hene, û mixabin têkilî di nava kurdên diasporaya de jî gelek lawaz in, herdem ku pêdiviya me heye bi têkiliyên xurt li ser binyata yek netew, yek welat, yek çarenivîs di navbera Rojava, Rojhilat, Bakur û Başûr de.

P: Gelo tu derbasbûya PDKÎ li derheq pîrsa netewê Kurd bi giştî çawa dibînî?

B: Goman nîne ku PDKÎ partiyeke netewî ya Gelê kurd e, ku xebata wê dirêjîpêdan û berdewamî ye ji bo xebata rizgarîxwazî ya Gelê kurd ya ku her ji serdema serhildana Nehrî û Semkoyê Şikakî û komela JK e, û damezrandina komara Kurdistan (1946-1947) baştirîn belge li ser selmandina rêbaza netewî ya PDKÎ, û her ku xebata netewî ya PDKÎ di serdema Dr. Qasimlo de xuya bû û heta îro ku ew xebata netewî bi xebata nû ya bi navê “Rasana Rojhilat” ve berdewam dibe ji bo heman daxwazên şoreşên kurdî û Komara Mihebad e, ji bo misogerkirina mafên netewî yê Gelê kurd û parastina xaka Kurdistanê ye.

P: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê xebatê dike ji bo

bideştveanîna mafê netewê Kurd li Rojhilatê Kurdistan. Gelo tu siyaseta PDKÎ li derheq parçên din ên Kurdistanê çawa dibînî?

B: Bi rastî rêbaza netewî ya Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê xuya ye û bi bawariya min siyaseteke bi aqilmendî peyrew dîke dîr ji tundrewiyê û mîlmilane û hevrikiyên olî yê dinabera şîe û sine de.



PDKÎ bi siyaseta xwe derbirîne ji daxwaz û xwestên milletê kurd dike û herwiha derbirîne ji opoziyaneke lêberal û moderin dike ji aliyê avakirina sîstemeke sikolar û demokratîk-waz û li gorî agahiyan ku têkiliyên dîplomat yê baş digel Fransa û Ewropa hene, û xwedan sengek cemawerî mezin e, tevî ku PDKÎ xwedan serbor û dîrokek mezin e, lewra dikare bi rolek mezin rabe, nemaze ku hemû rêberên vî partiyê hatine şehîdkirin “Pêşwa Qazî, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî”, ji ber vî yekê PDKÎ cihekî bilind di nax û wijdana milletê kurd de heye û herdem cihê hêviya vî milletê ye, û millet çaverê paşerojeke geş e, û bi xebata “Rasan” careke din hêviyên millet bi partiya Pêşwa û Qasimlo bihêztir dibin bi hêviya ku careke din bikaribe bi roleke mezin li ser asta Rojhilatê Kurdistanê û herwiha li tevaya Kurdistanê rabe, ku “Komara Kurdistan” li ser deştê pêşmerge û neviyên kelha dimdim û xelkê pir bi rûmet yê “Rojhilat” nûjen û dubare bibe.

Pîroz be 75emîn salroja damezrandina PDKÎ

Her bijîn û serkevtî bin



Hêla pir cihê şanaziyê, bo Hizba Demokrat çiye?



N: Nûredîn Sofizade

Îsal di 25ê Gelawêjê de Hizba Demokrat medaliya pir serfirazî ya derbaskirina 75 sal xebata xwe ya raşt û dirušt a xwe, li ser sîngê xwe dide.

Hizbek ku di heyamê wan 75 salan de gorî derfet û şewazên cuda cudaye xebatê, bê rawستیyan li ser hêla pirsê netewî ew xebat bi her şiklekî mumkin domandiye. Wê Hizbê di wî heyamê dûr û dirêj de gelek sextî û dijwarî û evraz û nişîv derbas kirine, lê bi îradeyekî roj bi rojê qahîmtir di qada xebatê de berxwedan kiriye û di wê derheqê de jî gelek nîrxên mezin dane.

Heya niha hekî çî renge ew hizbe negihîştibe armanca xwe ku bi deşt ve girtina mafê qedera gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê de ye, lê eva girîn bi hebûna wê Hizbê gelek şanazî hatine tomarkirin û gelek deştkevtên mezin bi deşt ve hatine.

Bo mînak ew Hizbe bû ku karî pişt heyamekî kurt ji avabûna xwe ve, dewleta Kurd rabigihîne û mora çêkirina yekemîn dewleta modern li şiklê Komarî de, li ser rûperê dîroka xebata rizgarîxwazaneya gelê Kurd tomar bike. Eva bû ku xwedî derketin ji pirsê netewî piştî şoreşa Simkoyê Şikak di Rojhilatê Kurdistanê de bû nasnama xebata wê Hizbê.

Piştî têkçûna Komara Kurdistanê jî, bi berevajiyê xebatên berê yê gelê Kurd, Hizba Demokrat gelek zû karî birînên xwe nojdar bike û bona gihîştina bi hemên armancê, di meydana xebatê de bimîne û bi hebûna xwe, nehêle gelê me bê hêvî be,



nehêle îrada berxwedanê bimre, nehêle hešta netewî bitemire û kêmbê, ji aliyekî dinê ve jî man û berdewambûna Hizba Demokrat di qada xebatê de, nehêla dijmin jî bigihîje xweziya xwe ku wisa bizane bi têkçûna Komara Kurdistanê, kariye agirê şoreşa Kurd bitemirîne û dengê mafxwaziya Kurdan bifetisîne.

PDKÎ bi heman îrada deşt-pêkê ku hate avabûn, di heyamê wan 75 sal temenê xwe de alahilgirê xebata netewî demokratîk bûye û biger gorî qonaxan û guhartinan xwe pêşxistiye û roj bi rojê xwe pêşxistiye.

Hemî dijwarî û evraz û nişîvên ser rêka xebata wê hizbê tu caran nekarîne wê bêxne qedeman, yan hizba demokrat ji ber bandora guhartinan, ji hêla serekeye xwe û stratêjiya xebata xwe derkevtibe.

Mana li ser hêla xebata netewî ya wê hizbê hinde bandor hebûye ku hešta netewî di Rojhilatê Kurdistanê de ji ya hemî Kurdên perçên dinê yê Kurdistanê bihêztir e.

Yekitî û yekdengiya di nava xelkê Rojhilatê de heyî, renge bi wî awayî di çî yek ji perçên din yê Kurdistanê de nebe.

Xelkê Rojhilatê bi bandor wergirtin ji hêla netewî ya PDKÎ, tenê Kurdîniyê dîkin û dilê wan hertim bo xweşî û nexweşiyên xwêşk û birayên me yê Kurd di parên din yê Kurdistanê de lêdide. Bê

guma eva hemî “olguwergirtin” û peyrewikirin ji heman hêla netewî ya xebata PDKÎ bûye.

Evane hemî şanazîne û para zaf ya wan şanaziyan jî wedigere bo siyaset û hêla serrast ya xebata PDKÎ.

Şanaziyên PDKÎ gelek in û renge di gotarekî wiha de kes nekare wan bas bike. Ez dikarim tenê tîtrwara çend mînakekan bînim:

1-Baweriya neguher bi pirsê netewî û hermana li ser wê hêlê, weke diyarîkirina stratêjiya bona gihîştina bi mafê netewî, îcar bi her şikl û şewazekî mumkine çareseriya wê pirsê ku gelê Kurd

bikare her bixwe qedera xwe bigre deştê xwe.

2-Baweriyekî kûr bi demokrasîyê û demokratîzekirina civakê, pêkvejiyana hemî cudahiyên regezî, cinsî, olî, civakî, qatî, bawerî û siyasî.

3-Baweriyekî kûr bi dedperweriya civakî, weke li varê madî û siyasî û wekheviya jin û mêran, her lewma PDKÎ bona çêkirina civakekî bextewer di pêşeroja Kurdistanê azad de, armanca “Sosyalîzma Demokratîk” wek erkê pêşerojê diyarî kiriye.

4-Baweriyekî kûr bi azadiya siyasî weke “Ploralîzm” an ku azadiya Partîyan û civînan û çêbûna belavok û medyayên azad û heta rexnegir.

5-Baweriya kûr ya PDKÎ bi çareseriya pirsan û yek ji wan pirsê netewî, ji rêka danûstandin û diyalogê ve, ku mixabin her ew bawera kur bi diyalogê bû, ku bûye sedema dana nîrxên mezin ji bo wê Hizbê.

6-Paraştina serbixweyiya siyasî û biryardanê yek ji mez-



intirîn şanaziyê wê Hizbê bûye, û dosateyeyan bi berevajî dujminayetiya tu hêz û aliyekê di diplomasî û peywendiya wê de nekariye bandor û giraniyê bêxe ser biryar û helwesta wê hizbê û siyasta serbixweya wê hindî libekê biribe jêr pirsyarê.

Ew şanaziyanene ku PDKÎ û hemî endam û alîgir û bi giştî xelkê welatparêz yê Rojhilatê Kurdistanê pê dinazin û serfiraziyê pêwe dîkin.

Gelawêja Kurd û Belûçan!



N: Eskender Ceiferî

Beriya 75 salan ronahiya rojê, agirê berxwedanê, tîrêjên tevgera Kurdî û şoreşa Kurdan bi rengê bêhempa û cuda, berê xwe da Kurdistaniyan. Roja 25ê Gelawêjê, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li Rojhilatê Kurdistanê li ser destê Qazî Mihemed hate avakirin.

Li Kurdistanê, ev roj ji bo Kurdan pîroz e. Lê neteweyek din jî heye ku wek Kurdan daxwaza mafên xwe dike û ev roj ji wê neteweyê re jî pîroz e.

Belûçan, roja 25ê Gelawêja 1947an dewleta Belûçistanê ragihandin ku tam ji derdorên xwe cuda û azad bû. Sala 1948an ew dewlet hate têk-birin û careke din vegeyriya ser Pakîstanê. Ew dewlet li ser destê Mîrehmed Yarxan li Qelatê hatibû ragihandin û serê hemû Belûçand pê bilind bû. Ji wê demê ve heya niha, roja 25ê Gelawêjê, ji bo Belûçan jî pîroz e û ew, wê rojê wek Roja Netewî ya Belûçan binav dikan.

Wek çawan Kurd jî daxwaza mafên xwe dikan, Belûç jî daxwaza mafên xwe dikan. Niha li Belûçistanê Îranê ku wek Belûçistanê Rojava tê binavkirin, xebateke xurt ji bo dabinkirina mafên netewî û olî yên wan berdewam e. Belûç dibêjin ew her sal wê rojê pîroz dikan û tînin bîra gelê xwe ku ewê her û her di vê rêbazê de bin.

Çarenivîsa wan jî hinek dişibihe çarenivîsa Kurdan. Wan jî weke Kurdan, nêzikî salekê, dewleta xwe hebûn. Komplo û îxanetê, jiyan li wan tal kirin û ew vegeandin ser desthilata gemar a ku ew naxwazin pê re bin. Ji xeynî Belûçan Pakîstanê, yên Îran û

Efxaniştanê jî wê rojê pîroz dikan.

Pêşewayê Kurdan, nemir Qazî Mihemed jî ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ava kir, Komara Kurdistanê jî bi piştewaniya netewa xwe ava kir. Lê dawiyê komplo û îxanetê dev ji Kurdan jî berneda. Şayê Farsan êrîşî ser Kurdistanê kir û Komara Kurdan jî têk çû.

Dewleta ku nêzikî salekê bû li ser piyan bû û gelek jî pêşketin li Kurdistanê pêk anîbûn, mixabin nekarî zêdetir bimîne. Qazî Mihemed biryar da ji bo ku xwîna Kurdan neyê rijandin, xwe radeşt bike.

Wî xwe radeşt kir û canê xwe yê paqij, kire gorî nîştiman. Lê wî rasiparte xebatkarên piştî xwe ku wê rêbazê bidomînin.

Piştî 75 salan ji avakirina partiya ku li ser destê wî û hevalên wî hatibû avakirin, lê hîn xebat didome.

Xebata ku wê demê hate destpêkirin, bi hatina Dr. Ebdulrehman Qasimlo re careke din dengê xwe bilind kir. Li Kurdistanê dengê mafxwaziyê careke din bilind bû û Kurdan got em hîn zîndî



ne.

Desthilata gemar a navend, biryara qirkirina Kurdan da, lê Kurdan li ber xwe da. Bi hezaran şehîd dan lê dev ji rêbazê bernedan.

Bi hezaran gund hatin şewitandin û Kurd raştî koçberî, girtin û darvekirinê hatin, lê wan dev ji mafxwaziyê bernedan.

Qirkirina wan hîn berdewam kir heya dema ku Dr. Qasimlo ji aliyê têrorîstên rejîma faşîstên Tehranê ve hate têrorkirin, lê dîsa jî partiya wî, li ser piyan ma.

Piştî du salan, Dr. Şerefkendî jî ku ketibû dewsa wî, bi heman şewazê ji aliyê têrorîstên Îranê ve hate têrorkirin. Lê wek Qasimlo gotibû, tevî ku wî canê xwe gorî kir, lê Kurd hîn mane û rêbaza wî berdewam kir.

Mekteba Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, heya îro jî ji aliyê keç û xortên Kurd ve avedan e.

Her roj, ciwan, ref bi ref tevî şoreşê dibin û dayîk û bav jî bi hebûna van xortan şanaziyê dikan. Qet li Kurdistanê dê û bavên ku wan zarokên xwe şermezar bikin, nayên dîtin. Heman tişt jî, remz û sedema mana netewa Kurd e. Heya dema ku berxwedan hebe, ev tevger jî wê bidome.

Ji çend salan beriya niha ve Rasanê destpê kiriye. Qonaxa nû ya xebata PDKÎ, rejîm tirsandiye. Ji destpêka Rasanê ve PDKÎ dehan şehîd dan, lê dîsa jî wargeha xebatê, êvirgeha serhildanê û çepera berxwedanê, avedan e.

Hem Rasan û hem jî avakirina Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, bûne qonaxa avaker ji bo pêşeroja Rojhilatê Kurdistanê.

Di asta Îranê de jî, Kongireya Neteweyên Îrana Fêdêral, ziravê rejîmê qetandiye. Ew dizanin êdî Kurd, Belûç, Turkemen, Azerî û Ereb ji bo pêşerojê li hev nêzik dibin.

Wek gotara kek Miştêfa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Nasir Bulîdeyî serkirdeyê Belûçan li Parlamentoya Ewropayê gotin, ewê di xebata xwe de li dijî dagirkeran berdewam bin û qonaxeke hevxeberiyê di navbera neteweyên ne Fars de li Îranê destpê kiriye. Ji xwe 25ê Gelawêjê, ya Kurd û Belûçan e, lê ji ber hevxeberiyê, vê carê Gelawêj li Kurd, Belûç, Ereb, Turkemen û Azeriyan jî pîroz be.

PDK Îranê, Rêkxistina Siyaset û Exlaq



N: Serbest Urmiye

75 sal xebata berdewam, fedakarî û wefadriya bê dawî di pêxema bideştveanîna armancên siyasî û neteweyî di refên rêkxistîneke siyasî de, nîşana rastî û berheqîya wê rêkxistinê û serbilindiya damezirîner, rêveber û xebatkarên wê ye. PDK Îranê jî îsal 75 sal ji temenê xebat û cangorîtiyê di pêxema rizgariya gelê xwe de derbas dike û bêguman yek ji wan rêkxistinên siyasî- neteweyî ye ku meriv şanaziyê bi hemû dem û dewranên xebata wê dike. Xebat û cangorîkirin di pêxema netewe û niştîmanekê de rast e ku ji meriv re şanazî ye, lê heke bi hin taybetmeniyên bilind ên mirovahiyê ve nehên girêdan û xemilandin, renga û dibe ku nebin sedem ku xebatkar yan rêkxistîneke şoreşgêr bigihîje astekekê ku nesil pey nesilê amade be di çeperê wê de cangorî û wefadar bimîne. Yek ji wan taybetmendiyên exlaq e ku heke bi siyasî re nehê girêdan, di her qunaxê xebatê de dikare ji xebat û tekoşîna hêz yan rêkxistîneke şoreşgêr re bibe qeyran û lawaz bike. Lewma jî rêberiya PDK Îranê ew weke fakteke girîng di hemû qonaxên xebata PDKÎ yê de paraştine.

Exlaq û Siyaset

Exlaq û siyasî hertim du hewcehiyên serkevtina meriv di jîyan û xebatê de tîn hi-jmartin ku di her qonaxê dîroka jiyana mirovahiyê de bi terzekê hatine şirovekirin. Derheq peywendîya di navbera siyasî û exlaq de heya niha çar hizrên sereke

tên baskirinê.

1. Hizra dîrxistîna exlaq e ji siyasî ku li bi hizra siyasî ya “Machiavelli” tê naskirin. Di hizra wî de tevlibûna exlaq û siyasî bi hev re cihê tirsê ye û exlaq dibe asteng li ser riya serkevtina siyasî.

2. Hizra duhemîn ku renga ew qas alîgirê wê tine bin, dibêje ku divê exlaq bibe dîhajo-yê siyasî. Di vê hizrê de pêgeha exlaq nîzîm tê nirxandin û tenê di bin siya siyasî de wateya xwe werdigire.

3. Hebûna exlaq û siyasî di reng û şêklê taybet bi xwe de. Li gor wê ramanê, exlaq dikare tevli karê siyasî bibe, lê bi bawerîya wê exlaqê siyasî û takekesî du mijarên hevterîb û cuda dibe werin berhevdan.

4. Hizra yekîti yan bi hev re girêdana exlaq û siyasî. Li gor wê ramanê exlaq û siyasî du eslên zaniştî yê bi hev re girêdayî ne, bi terzekê ku meriv dikare exlaq bi siyasî takekesî û siyasî bi exlaqê giştî pênase bike.



Ya rastî be di wan sîstemên siyasî de ku tenê gihîştina deştilatê armanca wan e, piranî exlaq û siyasî bi hev re nalivin. Exlaq û siyasî tenê di demekê de pêkve tîn girêdan û ji hev naveqetin ku sîstem yan rêkxistîna siyasî bo armanca rizgariya mirov xebatê bike.

Di derheq exlaq û siyasî de him Ereştû û him jî Eflatûn li ser vî baweriyê bûn ku siyasî dewletan dibe li gor biha û eslên exlaqî bimeşe. Ji aliyê din ve jî Suqrata dibêje ku divê herî pêş de siyasî hewil bibe erkên exlaqî yê gel bide naskirin û perwerde kirin.

Bi kurtî heke meriv bal bikeşîne ser bingehên hizrî û siyasî yê xebata PDK Îranê, meriv dikare exlaq û siyasî bi hev re girêdayî bibîne. girîngîdan û paraştina kerameta meriv, hewildan li dijî sîstema înkâr û tunekirina nereweyî, regezî û ...hwd, perwerde û girîngîdan bi sîstema perwerdehiyê, dadperweriya civakî û bawerî bi hebûna fire rengiyê di qadên siyasî, civakî û çandî de ...hwd, ji meriv re dibêjin ku PDK Îranê bi tundî li dijî sîstema çewisandin, koletî û mifah wergirtinê ji meriv weke alavê deştê siyasî ye. Di heman demê de jî hewil dide ku siyasî xwe di civakeke zane de û li ser deştê endamên serbixwe bimeşîne.

Herwiha di berhema navdar a rêberê mezin Dr. Qasimlo, ya bi navê “Sîmayê Demokrat”, wate rûmeta merivê demokrat de jî meriv bi eşkere exlaq û perwerdekirina exlaqî di siyasî PDKÎ yê de seh dike.

Dr. Qasimlo wiha merivê demokrat pesin dike: Serbixwe û azad di biriyar danê de. Piştîwanê xebata rizgarîxwaziya gelê bindeşt. Li dijî sîstema netewexwaziya hişk û înkarkirina neteweyî din. Alîgirê wekhevîyê di civakê de, merivhez û li dijî faşîzmê.

Li gor şîroveya exlaq û siyasî û bingehên hizrî yê PDK Îranê û herwiha di şîroveya mirovê demokrat ji aliyê rêberê navdar ê PDKÎ ve, ev rastiye tê selimandin ku merema PDKÎ yê ji siyasî û xebatê tenê deştîlat û beşdarbûn di deştîlata welat de nine, belku civaka azad û perwerdekirina merivê azad û azadîxwaz e. Lewma di hemû temenê xebata wê de heya îro jî cangorî kirin di rêbaza PDKÎ û hewil dan bo gihîştin bi armancên wê ji aliyê gel ve cihê şanaziyê ye,

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (380)



Yûbîla Elmas
PARTIYA DEMOKRAT
A KURDISTANA ÎRANÊ

25'Ê GELAWÊJÊ
(1324-1399)

Ji Komara Kurdistanê Ve
Heya Rasan A Rojhilatê
75 Sal Xebata Berdewam Bona
Demokrasî û Rizgariya Neteweyî

PARTIYA DEMOKRAT A KURDISTANA ÎRANÊ
DEZGEHÊ RÊKXISTINA GIŞTÎ